



Siyaseta Dij Nîjadperestiyê

Dêûbav û lênerên hêja

Wezareta Perwerdehiyê her coreyên nijadperestiyê red dike û bi rakirina hemî coreyên cudakariya nijadî di xwendegehên giştî yên NSW de pabend e. Armanca Wezaretê [Anti-Racism Policy](#) (Siyaseta Dij Nîjadperestiyê) ku di hawirdora xwendegehê de tu xwendekar, karmend, dêûbav, lêner yan endamê civatê rastî nijadperestiyê nebin.

Ji hemî endamên civata xwendegehê daxwaza alîkariya li dij nijadperestiyê bi rêzgirtina ji bo çand, ziman û paşerehên olî yên kesên din tên xwestin, û awayên ku pejirandin û hevhengiya di hawirdora xwendegehê de pêşve bibin.

Her xwendegehek Karmend Pêwindiya Dij Nijadperestiyê heye (Anti-Racism Contact Officer (ARCO)) ku ew ji bo dijberiya nijadperestiyê hatiye perwedekirin û piştgiriya civaka xwendegehê dike dema giliyên nijadperestiyê li xwendegehê dibin. Ji bo bêtir agahdarî derbarê siyaset û rola ARCO biçe [Anti-Racism Policy - Information for parents and carers](#) (Siyaseta Dij Nijadperestiyê - Agahdariya ji bo dêûbav û lêneran).

Spas ji bo alîkirina me da ku hawîrdoreke xwendegehê ya erênî hebe ku hemî coreyên nijadperestiyê têne red kirin. Ji kerema xwe pêwindiyê bi min re deynin ger hûn yan jî zarokê we rûbirûyî nijadperestiyê dibe, yan dibin şahidê kesê ku li xwendegeha me rûbirûyî nijadperestiyê dibe, yan jî heke pêwistiya we bi bêtir agahdarî yan piştgirî hebe.

Li gel rêzê

Midûr

Alîkariya wergêr

Ger agahdariya bêtir dixwazbikin û pêwistiya we bi wergêr ji bo pêwindîgirêdana bi xwendegehê yan bi Midûr re, ji kerema xwe daxwaza Xizmeta Wergerandina Telefonê 131 450 bizimanê xwe bikin.

Hejmara telefona xwendegehê bidin operator û dê operator telefone xwendegehê bike ji bo daxwaza wergêr ku alîkariya te bike.

Ev xizmeta wergerandinê bê pereye.